Derçûn ji desthelata manayê

Hozan di navbera helbest û exlaqî de

Hoşeng Şêx Mihemed

Diyare salên heftêyan, helbest û rûdawên siyasî û neteweyî têkhelî hev bibûn. Renge êkem car be helbest û siyaset wesan bihêz tevlîhev bibin, ku birengekê dibînîn, rûdawên siyasî, anku mêjuwa neteweyî dibe gewhera helbestê, newekî helbest bixwe, bankûya ku rûdawên siyasî, dorpêça helbestê dike û ji helbest û statîka û ciwankariya helbestê dûr dihêxin û pitir mêjû dibe babeta helbestî û keresteya helbesta here diyar û aşkira, di vê derê de helbest, dibe gotareka siyasî, yan hez dikey bibêjî gotareka neteweyî, şoreşgêrî, mêjûyî, peyamdar ku helbest tê de dibe siyaset, xebat pêşmergayetî, qehremanî, welatparêzî, îdyolojiya, komeka bihayên neteweyî, lê helbest bi xwe, di helbestê de feramoş dibe û nahête bercestekirin.

Diyar e li vê derê min nevêt, bi çu rengan ku bibêjim.. Xirabe yan başe ku helbest di helbestê de hebû yan nebû, yan demê bibêjim helbest dibû her tiştek û ne dibû helbest û ez ji biha wan helbestvan û helbestan kêm bikem, nexêr eve mebesta min nîne, belkî min divêt bitinê raveya vê çendê bikem ka helbest demê bû cemawerî û dû qonaxîda serihelda.. Çewan serihilda û çi terzek helbestî serihilda, me merem nî ye bi çavê evro berê xwe bideyne berhemên wî qonaxî û bi tenê layenên silbî yên wan amaje pê bideyn. Belkî me divê em têbigehîn di wê qonaxê de helbestê çi kir û çewan kir?!

Demê heger ez dûrbûna helbestê ji helbestê û nêzîkbûna wî ji mêjûyê bi karek xirab bibînim, eve ne merce tu jî bi heman dîtin berê xwe bideyê, belkî ya min ravekirinek kesokiye gumankiye û tu jî

dişêy ravek berûvajî encam bidî.

Di vî qonaxî de, helbest bi binemayek siyasî hate darêtin, di yekem sat de ku delîve bû helbestek tijî şariyet ji dayik bibe, lê helbestek çêbû berûvajî..., bû her tişt û nebû helbest, di wê gavê de demê helbest ji destê komeka mirovên ayînî hate der, nebû projek rewşenbîrî giştî, belkî helbest bû projek siyasî û neteweyî, helbest jî pitir bû pêşmerge û siyasî ne wek helbestvan, di vê satî de.. Çewan helbestê helbestvan winda kir, helbestvan jî bi heman şêwe, helbest winda kir.

Di vê derê de ez dibînim, helbest kefte di navbera helbest û exlaqî de, helbest û nîştmanperweriyê de, raste helbestvan di vê derê de helbest û gewhera helbestê winda kir, lê beramber vê çendê helbestvan bû mirovek pêgîr bi meselên neteweyî û li ser astê exlaqî bi çavekê pir rêz û biha hate temaşakirin, helbestvanan bi vê çendê şûnasek neteweyî ji bo xwe çêkirin, ne wek helbestî, anku şûnasek exlaqî ne wek edebî ku helbestvan jî wek pêşmerge û xelkê xweragir û qehreman di yek rêzî de, dibûne xwedan heman exlaqên neteweperêz, xebatgêr û şorşgêran.

Anku di vî qonaxî de, gewhera siyasetê ji gewhera helbestê.. Ji ruha helbestvanî nêzîktir bû, anku helbestvanên wê gavê, ji bilî ku helbest nivîs bin, xebatkar bûn, ji bilî ku helbestvan bin.. Pêşmerge bûn, ji bilî helbestê ji helbest û statîkayê bigeryên.. Li manayên siyasî digeriyan, helbest bo wan bitinê dergehek siyasî bû, da tê de bi çine di nav mêjûya neteweyda, helbest xem nebû, netewe û kêşên netewey xem bûn, bûye ew helbestên divî qonaxîda çêbûn, xalî bûn ji helbestê, helbest bû mêjûyên rûdawên siyasî, Pêşmergên qehreman û serikirdên nemir.

Bivê rêkê. Helbestvan şiyan xwe û helbestê li def cemawerî xuştivî bikin û helbest bi dizîkîve bi destinivîs navbera xelkî wek deqên pîroz ew dest û ew dest dikirin û dihatine xwandin û jiber kirin, bi vî çendê jî, exlaqa xebata nihênî û kurdayetiya bizehmet, pîrozî da wan deqên tijî bûn ji peyvên mîna (Pêşmerge, Kurdistan, nîştiman û çemkên din yên xebata siyasiya kurdî) bûn,


Muweyed Teyib

Renge diyartirîn deng di wê qonaxî de Muweyed Teyib be ku karîgeriyek mezin kiriye û piştî wî jî komeka nivîseran keftîne bin karîgeriya wî û renge jî xewn bi kesayetî û navê Muweyed Teyibî dîtbin wek helbestvanek neteweyî.. Kurdperwer

ku li ser astê exlaqî wek qehremanek dihête temaşakirin.
Lê renge şansên helbestvanên dî weha nebe ku wek qareman bihên naskirin û eger jî ne têkistên helbestîne, belkî kawdanên siyasî û rûdawên wan qonaxanin ku desthelat didestê helbestê bi xwe da nebû, belkî didestê siyasetêda bû, helbest binemaya helbestê nebû, belkî siyaset binema helbestê bû, ew serfirazî jî serfîraziya helbestê nebû, belkî serfîraziya siyasî bû.
Diyar e bitinê helbest û desthelata helbestê, dişêt dijî mêjû û mebestgerayî û manadaryê biraweste, bitinê helbestvan jî dişêt li hember nivîserên xwedavend biraweste, diyar e xwedavend ew nivîserên qehremanin, helbestvan jî nivîserên neqehremanin, helbestên nivîserên qehreman tijî mana û bihayên siyasî û hizirî û felsefî û mêjûyîne.
Lê helbestên nivîserên ne qehreman, tijî ciwankarî û statîka û helbestin, nivîserên xwedavend heta têkisteka xwe dixwîne renge çendîn car dest bo bihête qutan, lê nivîserên nexwedavend renge piraniya hozanên wî bikêr xwandinê nehên beramber cemawerî.
Têkistên xwedavenda, ewên tijî mana û babet, bi sanehî xwe didete xwandevanî û wek deqek girtî.. Bê girêk û asteng, li gel ruha xwendevanî û mêjûyê de tebayî ye. Çi hevdijî li gel cemawerî nîne.
Lê deqên azad, ewên estatîkî, her dem natebayiye li gel cemawerî. Min divê bibêjim yek ji taybetmendiyên hozana wê qonaxê, desthelata bêsinora manayane li ser têkistan û desthelata reha ya nivîseriye li ser helbestê. Helbestvan tê de kujekanane manayan dibexşe cemawerî û dûr ji helbestê mêjû û rûdawên siyasî bi navê helbestê didetê.
Di vê qonaxê de, helbestvan bûne qehreman û şoreşgêr, lê li ser hîsaba dorandina helbestvanî û helbestê.
Bi baweriya min jî, vê karîgeriyek nerênî li ser rewşenbîriya deverê kir. Di qonaxekê de delîve hat helbest dişiya.. Pêşberiyekî helbestvanîtir û pir estatîkatir pêşber bike, lê helbestvanên wê qonaxê, ew delîve kire dîlê destê siyaseteka takrehendane û sînorên zimanî û helbestê destnîşan kir û nehêlan deqên azad ji dayik bibin, helbest jî bibe deqek, derbirê ji êş û azarên takan bike, derbirê hawarên ruhek tak û xweser be, hoşmendiya helbestvanî nîşanî me bide, berûvajî hemû arastên dij bi têkistên azad.. Dane karî û bêdera rewşenbîrî bi binemaya siyasî mezin kir, bi tenê gotara siyasî di helbesta kurdî de hate pêş ne wek helbest yan estatîka yan azadiya têkistî.

Her wesa dibînîn evî binemay, renge heta salên pişti serhildanê jî û heta vê gavê jî rêgir be li berdem hozanek nû û cuda. Li gel komeka nivîseran.

Nivîserên xwedavend û qehreman.
Dorpêçkirina nasnama helbestê û zimanê helbestê, karek bû nivîserên salên heftiyan û heştiyan encam da, helbestvanên berî wan bi rêka binemaya dînî helbest û ziman dorpêç kirin û di sinorekê teng de asê kirin, nifşa heftê û heştêyan jî bi rêka binemaya siyasî ev kare kirin, nivîser bûne ew xwedavend û qehremanên ku helbest û xwendevanî dagîr bikin, komeka mana û bihayên siyasî di têkistên xwe de bidenê, xwandevan naçar be wan bihayan wekî xwe çawan nivîserî divêt werbigire.
Wan xwedavendan pênasek destnîşankirî da helbestê û helbest tê de dîl kir, bi vê çendê jî ew helbestvan bûne qehreman û helbest jî ezmûnek siyasî.
Di vê derê de helbestvan bû wîjdana cemawerî û xwedan bersivên pirsiyarên neteweyî, siyaset bû pile yek û helbest jî duwem, kesayetiya siyasiya helbestvanî jî giringtir û girantir bû, ji kesayetiya wî ya helbestî, manayên wan helbestvanan jî girêdayî wateyên siyasî bûn.
Bi baweriya min, li gel nivîserên xwedavend, siyaset wek gotarek karîger di nav rewşenbîriya me da serhilda û şiya kontirola helbestê bikin, ew nivîser jî di gewhera xwe de siyasî bûn, sewda li gel siyasetê dikirin ne wek helbestê, ew babetê di wî qonaxî de ji dayik dibû, gotarek siyasî bû, ne wek helbestî, anku di wî qonaxî de helbest çênebû, belkî gotara siyasî bû ku şiya li ser destê wan nivîseran bibe çêkerê ayetên siyasî û berhemên wan jî li gel pîrozî û bihayên dînî û siyasyên xwe bibine beşek ji pîrozî û yeqînan, cihekî taybet ji bo xwe bigirin, wek qehreman.
Anku piştî wan helbestvanan kontirola helbestê bi siyasetê kir, şiyan wênê qehremanek yan palewanek neteweyî bidene xwe, bûne dengê milletî û derbirê êş û azarên wan, wefaya xwe bo kêşeyên kurdayetî û neteweyî nîşan dan, navên serikirde û çiya û şehîd û pêşmerge û pîroziyên din yên siyasî kirine babetên berhemên xwe.
Bi rengek yeqînî ev babete pêşberkirin û bersiv ser hemû nihêniyên neteweyî didan, heta netewe.. Şoreş.. Xebat.. Pêşmergayetî, bû bersivek yeqînî ku çi delîve nema êdî nihêniyek yan gumanekî di nav xwe da rakin. Helbestvanên me jî berdewam bersivderên

demirastê pirsên siyasî bûn, cemawerî bê gengeşe deqên wan wek berhemek girtî werdigirt û dest bo diqutan û wek qehremanek temaşa dikirin.

Lê aya vê çi berhem hîna..? Helbest bire kê derê..?

Diyare demê helbestvan bûne xwedavendên siyasî û qehremanên neteweyî, di demekî de piştî wan siyaset kire, deng û ruha berhemên xwe, di heman dem de.. Wan helbest ji helbestê kire der, delîve nedan.. Helbest bibe xwedan gumanek helbestî, hizirî, yan her gumanek din, çi nihênî ji bo helbestê nehêlan, helbest pênase kir û nasnamek diyar û aşkira dayê, di vê qonaxê de.. Li gel tund bûn û alozbûna rewşa siyasî.. Helbest jî pitir û pitir dibû babetek dûrtir ji helbestê. Li gel dûrbûna neteweyî ji deskeftên siyasî, helbest jî ziyatir xwe winda dikir, li gel trajîdiyayên kurdî, helbesta kurdî jî pitir dibû mêjû û tomarkirina rûyidan û trajîdiyayan.

Anku siyaset çend şêlî dibû.. Nasnama helbestê zelaltir lêdihat.. Siyaset çend dibû trajîdiya.. Helbest jî pitir dibû berhemek kehî, hêrişên dijminan çend xurtir dibû li ser kurdan, helbestvan jî pitir helbest dorpêç dikir bi wateyên aşkera, pîrozî û yeqîniyan, kurd çend bedbext û şkestîtir dibû, helbestvan jî pitir desthelata xwe bi ser helbestê ferz dikir û dikire wateyên diyar.

Em çend wek kurd berze dibûyin, ruha helbestê jî wesan di helbestê de dibû helm. Anku hawkêşek diyar û aşkira dirust bibû.. Li gel metirsiyên siyasî, berhemên helbestî jî pitir sade, sakar û aşkeratir dibû, zimanê helbestê.. Pitir û rastewxwetir diviya wan rûdanan tomar bike û careka dî bibêje, peywendiya ziman û wateyê gehişte astekî gelek sade ku renge di gelek berheman de, rûdawan bi temamî kontirola ziman û berhemî dikir û ziman tê de digehişte astê zimanê dijminî û dirûşim û hîtaf lêdanê.

Di vê qonaxê de, helbestvan dibû qehreman, xwedavendane bi ser helbestê zal dibû, ta xirabtirîn ast, helbest tepeser dikir.

Renge di vê derê de pêwîst be em bipirsîn.. Başe ji bo çî di wê qonaxê de, helbest neşiya bibe helbest û bû siyaset..? Egerên vê çendê çi bûn?

Ji bo çî helbest nebû ew ruh ewa li hember weryana belgekî û sema giyay li gel bayê, ciwaniya stêrekê, dengê balindeyekî, htd, raman dikir û hewil dida, xwe rave bike, yan belayenî kemewe manayekî bi dest ve bihîne?

Ji bo çî helbest bû derbirê ruha neteweyiya hemiyan û derbirê êş û azarên neteweyekî bi giştî ne wek ji bo kesê helbestvanî bi tenê?

Ji bo çî helbest kefte di bin kontirola siyasetê de ne wekî hizirê, yan felsefî, yan ruhê?
Heger çi bûn, em çewan dişên bersiva wan pirsan peyda bikin..?
Diyare, heger me bivê ravekî ji bo çêbûna nivîserên xwedavend bikin, bizanîn ji bo çî têkist bûne deqên ne azad û tijî wateyên siyasî, civakî, rewşenbîrî, exlaqî, mêjûyî, edebî û aboriya kurdî çewan bû.. Biniyasîn, vêca belkî hindek bersivan berhem bihînîn.
Renge demê em têbîniya hozana piştî serihildanê dikin, pitir em di rewşa salên heftiyan û heştiyan bigehîn, bizanîn ku di wê qonaxê de.. Helbestvan bara pitir li gel rûdanekê, yan serhatiyekê, yan karesatekê, yan destkeftekî, yan her rûdawek taybet di lehzeka mêjûyî de.. Da dest havête nivîsînê, anku piraniya berheman verêja rûdawên siyasî û civakî bûn, ne wek berhemê hizirkirin û ramanek felsefî, yan merîfî, yan ruhî..
Helbestvan pitir diviya helwîstê xwe nîşan bide û aşkera bike li hember rûdawan, karesat, pêşhatên siyasî, neteweyî, gelek erkên komelayetî, siyasî û neteweyî li ser milên helbestvanî bûn û diviya wan erkan bi cih bihîne, heger na, ji qehreman û palewanî dikeft û renge biba xayîn, xwefiroş, bezî, reşbîn û tirsinok. Çunke mihasebeka siyasî û neteweyî dihate kirin, anku pêwîst bû helbestvan kurdîniya xwe bi rêka helbestên xwe biselmîne û hemû mîllet bizanibe ku ew hez ji millet, nîştiman, serkirde, şehîd, ax û remzên xwe dike.
Anku rewşa siyasî û civakî û helwîst ji helbestvanî dixwast, helbestvan neçar bû helwîstek aşkira û rohn wergire li hember meselên neteweyî, heger wesa nekiriba eve dibû mirovek bê helwîst.
Ev helwîst û bê helwîstiye jî, egerek serekî bû ku helbestvan bibe mirovek pêgîr bi eqliyeta civakî û wekî wan hizir bike û helwîstê xwe, ewa guncay li gel hizra giştî nîşan bide.
Anku cemawer hest bike, ew jî yeke ji kurên milletê wan wekî wan hizir dike û temaşa şoreş, netewe û jiyanê dike. Tebayî ye li gel çemkên civakî, mirovekê yaxî û havî nîne, xwedan heman dîtin û sîstema hiziriya civakî û xelkî ye.
Ji ber vê çendê jî helbestvan neçar bû, derbirê ji xelkî bike ne wek ji xwe, basê pîroziyên giştî bike, ne wek yê taybet, basê xelkê bike, ne wek xwe, dengê hemûyan be bi giştî, ne wek ya xwe bi tenê.
Dîsan jî ji ber vê çendê zimanê helbestî zimanê hemûyan bû, zimanê taybetê helbestvanî nebû, babetê helbestî, babetê hemqyan bû, çi tğnê yê helbestvanî nebû, dunya helbestvanî, dunya xelkî bû.. Çi ferq û cudahî di navbera wan de nebû.